

Helbijartina Şaredariyê li Turkiyê

Reşoyê Pîrê

Gelê Kurd ji zû ve bi nasname û hestên kurdewariyê hewl dide him li Anqerê û him jî li Kurdistanê bibin pişikdarê desthilatdariyê

Di 29 ê Avdara borî de, helbijartinên şaredariyê li seranserê Turkiyê û Kurdistan dest pê kir. Di wê helbijartinê de, partiya Civaka Demokrat DTP, di herêma Kurdistanê, di pir bajar û navçeyan de bi serket " Amed, Şirnex, Êlih, Sêrt, Dêrsim, Wan, Çolemêrg û H.W.D. Ji ber ku Kurd li ser xaka xwe ne dewlet in û di şert û mercên îro de yekta riya desthilatdariyê bo Kurdan desthilatdariya herêmî ye û helbijartinên herêmî herdem pêwîst in . Û ji bo Kurdan wateya siyasî ya helbijartna rêvebirên herêmî pir û pir mezin e.

Ew encama serkeftinê ku, milletê Kurd li doza xwe xwedî derketî ye û ji gelên cîhanê re daye xuyan ku: Kurd azadîxwez in, ne şerxweaz in.

Gava mirov pîvanekê di navbera helbijartinên sala 2004 an (ku DTP-ê li gora helbijartinên sala 2004an şaredarên kevneşopiya DEHAP-ê divê helbijartinê de ji lîsta SHP-ê beşdarî helbijartinê bibûn) û yê îsal bike , wê bêguman serkeftina îsal û bi taybetî di dilê Kurdistanê " AMEDÊ"

de ber çav bibîne.

Lê divê ew serkeftna di helbijartinan de, - tevî berdeamiya şerê derûnî, biv, tirs û zixtên hemî dezgehên dewletê derketene hole, gelê me bi yek dengî got : Ev baweriya me ye!. Ev vîna me ye!.

Piştî demeke kin ji dawiya hebijartinan Destlata Tirk Di 17ê Nîsanê de, operasyonên polisên Tirk li dijî Partiya Civata Gel DTPê dest pê kir, û pir kes girtin. Ev bûyera ha li dijî berpirsiyarên DTPê di serê mirovan de pir pirsan vedike. Ji aliyê dozger ve pir guneh hene, ew guneh çiqas rast in em nizanin. Dozger berpirsiyarên DTP bi kuştina serokê belediya Amedê Osman Baydemir ji aliyê PKKê ve tewanbar dike. Tê gotin, ku hukumeta Erdogan, Osman Baydemir ji kuştinê rizgar kiriye. Û Polîs û leşkerên Tirkan di 23ê Nîsana îsal de, dîsa dane mêak kirin, ku her tiştên wan derew e. Leşkerên taybet li bajarê Colemêrgê bi awayeke hovane li zarokê Kurd 14 salî dan û ew pir birîndar kirin.

Bê guman divê şaredarên me Kurdan vê serkeftna xwe biparêzin û pêşdetir bibin.

Sedcar ev serkeftin li gelê me pîroz be û .

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re yê di girtîgehên Sûriyê de*